

Dumahîk : Piştgiya ...

Piştî serhildana sala 1982 an ya Humus-Hema û serhildana sala 2004an a Qamişloyê, desthilatdariya Beis û rijîma Esed hetanî îro bi serhildanek girseyî ya bi vî rengî re rûbirû nebûye. Di vê rewşa hanê de, nemimkune ku rijîm hebûna xwe berdewam bike. Bi tevî vê yekê, derûdorên ku di bin kevalê(postê) çepgiriya azadîxwaz, demokrasî û mafên mirovan de, beriya nûka piştgiya Sadamê dîktator dikirin, îro jî li Antaqayê xwepêşandanên ji bo piştgiya Beşar Esed dikin. Bêguman nemimkune ku tevger û hewldanên wisa, pêşiyê ji nû ve li pêş herikîna dîrokê bigrin. Ji ber kîjan sedeman dibe bila bibe, bi aşkere yan veşartî, ew ên ku piştgiya rijîma Beisê bikin, wê bibin şirîgê sûc û kiryarên Beşar Esed.

Li vê derê mijareka girîng a ku divê bête diyarkirin û bibîranîn, helwesta opozîsyona Erebên Sûriyê ye. Ji aliyê girûbên opozîsyona Suriyê ve, Heta vê gavê derbarê çawanîyeta Sûriyê piştî têkçûna Beşar , daxuyanî û bernameyêke sîyasî ya zelal nehateye dîyarkirin. Divê girûbên Opozîsyona erebî ya Sûriyê, ji bo pêvajoya piştî têkçûna rejîma Esed, bi awayekî aşkere sîyaseta xwe ya derbarê Kurdên li Sûriyê dîyar bike.

Îro ev tevgera gelêrî ya ku bi navê "Bihara Erebî" tête binavkirin, divê tenê wek hilweşandina rijîmên dîktator ên erebî neyête dîtin, herweha divê awayê çareserîya hemû meseleyên netewî, etnîkî û dînî yên vê cografyayê jî têkevin rojevê û bêne nirxandin. Gerek bête zanîn ku taybetiya herî girîng a sedsala 21ê jî ev e, ku meseleyên çaresernebûyî yên neteweyî, etnîkî û dînî cardin bûne yekemîn mijara rojevê. Di vê çarçoveyê de ,daxwazên netewî yên Kurdan, bi kêmtirîn qasê daxwazên gelê Filestînî, Sûdana Başûr û Kosowayê rewa û girîng in.

Ji bona vê yekê, em "*mafên çarenûsiyê*" ji

biryara Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê dikin, ku ev Encûmen roja 27/10/2011 di encama berhevbûna Kongreya Niştimanî ya Kurd Li Sûriyê hatibû hilbijartin. Hêviya me ev e, ku li ser heman zemînê Meclîsa Niştimanî ya Kurd li Sûriyê, bi beşdarbûna girûb û unsûrên din jî bihêztir û serkevtîtir be. Divê em bi bîr bînin, ku kîjan girûb dibe bila bibe, kîjan sedem tê nîşandan bila bê nîşandan, ew helwest û hewldana ku ji bo yekîtiyê xizmet neke wê di nav pêvajoya dîrokê bête mehkumkirin.

Di dawiyê de, ev nêzîkê pêncî û pênc sal in ku gelê Rojavayê Başûrê Kurdistan û Erebên Sûrî, ji aliyê rijîma Beis û malbata Esedê dîktator ve, bi awayek hovane têne perçiqandin, kuştin û zordariyek dijwar li ser wan tête kiran. Em ev hovîtiya Beşar Esed û rijîma wî û hevalbendên wî bi tûndrewî şermezar dikin...

Ji weşanên Kurdî yên nû

1-Pirtûka "Rêzimanê Kurdî" ya helbestvanê Kurd ê navdar Seydayê Mele Ehmedê Palo. Pirtûk ji 180 rûpelên mezin pêkhatî ye. Pirtûk hêjaye ku di pirtûkaxaneya zimênê de cih bigre û bê xwendin û lêkolînên zanistî li ser bêne çêkirin.

2-Pirtûka "Ramanek" ya nivîskar Lewendê Dalînî(Sêf Dawid) derket. Pirtûk ji 105 rûpelên piçûk û 13 kurte çîrokên pêkhatî ye. Hêja ye ku ev pirtûk a bi zimanê Kurdî bê xwendin û bi zanistî bête nirxandin